Dekubihev rediyalog, êşûhêviyan parvebikin. Hem di nav xwe de, û hem bi gelên dîtir ve parve bikin. Bo nivşê duwahatû yî, ku paş sedsalan li ser me lêkolin bike. Ji destpêkê ve ez mikur têm, ji bili pirtûkan, sînema roleke serata di pêkanîna pênasîn û zanyara min de listiye. Bi hûrbînî nayê bîra min, yekem film ku min temâse kirbû. Lê xweş tê bîra min, dema ez bi malbeta xwe re, em diçün sînema.

Ez yek ji wan zarokên bextewar bûm, ku malbata min malarî û bi Kurdeyatî navdar bû. Ji malbatên pêşketîxwaz bû, bi malbatêن fileh an re, yêner herî arêstokrat mîna mala Hana, Hadayê û Lahdo di taxa Bişêryê de, li bajarê Qamişlo, bi dostanî girêdayî hevbûn. Ew pêwendî, bi bandor bû ser min û malbata min ku her roja Înê, destûr didanme, em herin Sînema bofilmekî temâse bikin. Sê sînema li Qamişlo Fûad, Dîmesq, Hedad û yeka havîni servekirî, bi navê Şeherzad hebûn. Min sînema mîna navendek pêwendîdar bi cihaneke dîtir ve didit.

Wê çaxê pir kêm malbatên Kurd diçün sînema, jibîlî malbatên Ereb û Xiristîyanan. Weke zarokek deh salî, sînema bi min pir sihbarz dihat xuyanîkirin. Bi rastî, ta ku bi xwe re û bi we re rastgo bim, di destpêkê de sînema bo min weke listik û demborîn bû.

Bala min li ser cilûberg, por(pirc) û rewşa hestyarî a listikvanan, wê hîngê balkêsiya min dikşand. Pasê têgihijit ku sînema xwedî nêrin e, huner e, alavekî derbirîn û zanîndan e. Wê çaxê min bir bir ku sînema gotarekî vebêjiyê ye, xwedî dequeke dîtwerî ye, zimanekî taybet li ba wê heye. Zimanekî pêwendîyê ye, wêne ûdeng hokare pêre, ulêvegerek eperwerdeyî ye. Hîngâ ez bûme sînemahêzker. Wê gavê xwesteka xwendina sînemalibaminçebûnkerwanê biber Mosko ve destpêkî. Cihê gotinê ye, Y.Guney bandorek mezin li min kir ku ev xwestek li ba min peyda bibe. Wisa jî pêdiviyê destnîsan bikim, ku em tev deyndarên Yelmez Guney ne, ku guherînek bêhempa di hişême de pêk anî. Ji dema Guney ve, Kurd yekemîn car xwe li ser perdeya sîpî dîtin, nasnameya xwe a sînemayî nas kirin. Bi weteya Kurd neçar bûn, weke gelên cîhanê, kul û êşen xwe bi rengeki hunerî, pêşkêşî cîhanê biker.

Erdhejin hat ji bersiva wî kesî, yê dixwest di eniya min de komonîzmê bixwîne û bîbîne. Encama moxilkirina wî bo giyanê min, giha baweriyek û pêşniyarek ku xwendina rojnamegeriya TV bixwînim. Wê keliyê bêdengiya min Kenya, weke ku dara bê sîber bim. Ez bûm navek, ku li navnîsana şeva xwe digerya, bêriya min bi destûpê, bi aliye hevoka, li her derê, em zarokên sitemkariyê ne ve diçû. Wê keliyê, ez li ezmanekî jînî digeryam daku bibînim kesekî ji wan 12 endam an, bibêjê. Ev bîryar zalim e!, min êezman jê re bi rengen dagirtibana.

Lê, min red kir û xwestika xwendî



Bêkes Têlo

na sînema ji wan re diyar kir. Paş danûstendinek zor û dirêj, bîryar bû ku têkevîm pişbirkê di Enîstîfûta (destgeha) VGÎK de ya lîstikvan û derhinêrân fêr dike û derçûn dike. VGÎK pir derhineren bi nav û deng mîna Andrey Tarkovski, xwendina xwe tê de qedandine û mamosten mîna Sirgê Eyzinşteyîn û Mîxael Rûm tê de kar kirine. Hemû xwestek û şertîn Komisyonâ pişbirkê danibû ber pêşbirkar an, min pêk anî.

Rêportajekî bi wêne, pandomîmayek û xwendina helbestekê. Ev bûn mercenâku li hember me danibûn. Min her sê qezenc kir, 13-e pirefesör ji endamên komisoyna pişbirkê, 12 endam bi bêdudîl min qebûl kirin. Lê yê 13an, pirsek tenê ji min kir, bersiva pirsa wî, jîyana min hemû guherand; Tu Komonistî? Na! Ez dengê gel ê ku di rohnahiyê de, bi henasîn demokrat û lêberal, cihekî ji xwe re digere, wisa min bersiva xwe da.

Ewkesê l3an, bizimanêkînermokî, ji min xwest çend keli derêm ji der ve û paşê ew ê gazî min bike. Tiştek mîna lihîevîyemayînê qûrs, aloz û giyan rûxankar nîne. Lê ez, weqas ji xwe bawer bûm ku ti mereq bi min re çenebû. Ji ber ku bixwebawerî hêzeke, hinasa duwem dide mirov, û hokare pê re bo bije. Bê wê, mirov weke giyayeke li sahara ye, weke mijâ sipî ji hev belav û zûka wenda dibe. Loma tê gotin, gava mirov li ber sikratê ye, hêviya dawî dimire. Li kerîdora nîvtarî, weke giyayê la li rîceke avê bigere, li wîr li berdergehê mam. Hebek bayê tozgîrtî dest avêt dilê min. Gelo dibe ew hezkirina sînema ji zarokî ve bi bîryara yek kesî ve wenda bibe?.

Ewsîngâ bi elektrik dagirfî, ji evîna sînema de kîlîkekê de vemire? Li ser pêşîla berfa Mosko, gelo bi germahiya ciwanekî ew ê hest bîbe û bîhîleye? Gelo Mosko ew ê bîhîle rajim berdaxekî mey û bibêjîm Noşşşşşş! noş Ji te re hey peytexta wekhevîye û diya belengazan?!

Erdhejin hat ji bersiva wî kesî, yê dixwest di eniya min de komonîzmê bixwîne û bîbîne. Encama moxilkirina wî bo giyanê min, giha baweriyek û pêşniyarek ku xwendina rojnamegeriya TV bixwînim. Wê keliyê bêdengiya min Kenya, weke ku dara bê sîber bim. Ez bûm navek, ku li navnîsana şeva xwe digerya, bêriya min bi destûpê, bi aliye hevoka, li her derê, em zarokên sitemkariyê ne ve diçû. Wê keliyê, ez li ezmanekî jînî digeryam daku bibînim kesekî ji wan 12 endam an, bibêjê. Ev bîryar zalim e!, min êezman jê re bi rengen dagirtibana.

Wê keliyê, dengekî ji giyanê min derket, gelo mirov çawa bîghê dengê yezdan? weke nûnerê bedewbûn û wekeheviyê? Nexwe bejnûbala min bo rojnamegeriya TV ye! Aha, ci pê ve heye, xem naake li wir ez ê filmekî derhînîm. Wisa gîham baweriyekê, weke ya helbestvanê Firansî Pol Îl-war ku di helbesta „Razê“, de dibêj:

Razê

bi rokê re di çavekî de
Û di ya ditir de bi heyvî re

Bar bike bi gorên bahozê re
Bi ava çemekî merqdar
Bi meyzekirneke nû
Ber bi jor ve.

Bi mebseta agirê ji rokê di jiyanê de, çiqas bi şewat be, gerek tu hêvi wekehevyê wendanekî, üjîyana xwe berdewam bikî. Bi nêrîneke nû ve, wisa mirov dikare biser şikeştiñen xwe ve biser bikeve. Minev formûle, kir rîznameya xwe û bû sîbera salen hatuwî.

Pas 5 salan, ji xwendina dîrok, şêwe û têknîka programan û derhîna filmîn dekomental, ji rojnamevanîya cihani a TV, em bi hûrbînî fêr bûn. Derçûna min bi filmekî dekomental li ser jiyan û tekoşîna xebatkar, helbestvanê gewre Cegerxwîn, min saz kir û diploma rojnamevatîya TV wergirt. Gava dawî ji qedandina xwedînê mabû, ew bû ku em sînd û peyman bixwin ku tim li dûv rastiyê bin û rexneya cewteyan bikin.

Divêdemadawî de, ûbi taybetî paş teqîna şoreşa Sûrî, her tiş li tev hev bûye. Kî rabû û xwe kir rojnamenûs, an bû bernâme sazkar, bêyî alavên herî bingehîn ji rojnamegerî bidest bixin. Hewaraxwedisâ dighênimîkeş û xorîn Rojava ku di ragihandina Kurdi de dixebeitin an dixwazin tê de bixebeitin van xêzên dawî baş li berçav derbas bikin.

Rojnamenûso- (ê)! Tu carî bawer neke ku xwêner, guhdarvan anjî, dîtwer balûle ne, ê balûle tu yî, çimkî ev raman di serê te de heye. Wisa jî, jîbirneke, asteyaaazadiyo rojnamenûs li te wedigere, ne li rîberê te yê TV an rojnameya ku tê de kar dikî. Jîbir neke ku bo rastiyê derîni, tê gelek car nexwêş bikevî û serêşî bo xwe bînî. Bela di bîra te de be, ku peyv çekê te ye û hemû jî ditirsin. Çiqas kîfâ te ji kesekî re neyê jî, mafê te tune, malbatanjiyana wî a taybettêxî metirsîyan. Û bela her gav di bala te de be, tu çiqas kesekî rexne bikî, lê ticarî wî nizim neke. Ger tu dixwazî rojnamevanek serkeftî bî, ji şelaviya bireve, ji partî û kanalên wan, xwe biparêz û dûr bixe. Û vê sîndû bide:

Sûnd dixum.. Rastî û tenê rastiyê binivîsinim û bi lêv bikim.

Sûnd dixum.. Bûyeran berovaje nekim.

Sûnd dixum.. Derewan, nenivîsinim an bilêv bikim.

Sûnd dixum.. Rêzgirtina temâsevan, guhdar û dîtweran bîgrîm.

Sûnd dixum.. Rastgo bim.

Sûnd dixum.. Tenê belge û dekomament pêşkêş bikim.

Sûnd dixum.. Rojnamenûs bim. Wisa min zanokeya Mosko beşê rojnamenûs qedand .

Serokê Cezayirê Pişti Vi Temenê Mezin Hê Aqilek Ji Xwe Re Negirtiye



Xalis Misewer

Kurdan di sala 1960 û, di sinema Amûdê de ji ŞoreŞ Cezayirê re bibûn qurban, û pereyên bilêtén zarokên pakrewan diçün ji ŞoreŞvanen Cezayirê re, ku Bûteflîqa ji xwedîgîravî ŞoreŞvanekê vê ŞoreŞ bû, ku pereyên van pakrewanen nemir wi ji xwaribûn. Ne bes e wilo ji, lê gelek caran qewlê mamûr û kakeren Kurdan ji vê ŞoreŞ re bi rî ve dibûn. Vêca ev serokê newefadar tu tişti li bira xwe nayîne, û ŞoreŞgêrye mîletê xwe ji bir dîke, çimkî iro ji bi wi awayê çepel Bûteflîqa dixwaze ŞoreŞ Rojava bi awayekî Şofînizm û dûrî warê mirovahyê tê bibe. Ji vir tê xuyakirin ku Bûteflîqa naxwaze ŞoreŞ Şûrî bêyî serokê rejîm biser bikeve. Û hewl dide ku Tirkîye, û İran, Û réxistina Şûrî yê, evqasî di ser re dijitiya hev dîkin, wan li hevdû bine û hemû gemara wan bi ser serê mîletê Kurd de bîbarine. Gelo dijitiya wi bi Kurdan re tê ci wateyê? û Kurd divabe li li hember vê yekê çawa xwe biparêzin?. Bê gunan dem ne dema berê ye ku Bûteflîqa karibe bi awayekî hesan pêkhatîyen ŞoreŞ mîletê Kurd bide erdê û tê bibe, ji ber ku Kurdan bidestxistinê xwe bi xwîna Şehidan qezenc kirine, û xwe di civaka diweli de bîqebulkirin dane, û xwe gîhandine asteke bilind di warê siyaseta cihani de, û hevalbendê wan mîna

herdû dewletên mezin û Ewrupa ji bi wan re di lebatî de ne, lê ya gîringirin ew e ku Kurd iro xwedî hêzeke leşkeri pir payebilind û fidîkar in, ta caran ne Bûteflîqa û ne ji bili wi ji nikarin, lê li hember vê yekê ji disanê em dibêjîn, ji Kurdan re kongirice netewî û bîlez hewcedar e, ta yekitiye resen û bi bingeh bi xew re bine.

Ji bo vê ji divabe Kurd nakokyên nav xwe rakin û destê Kurdewariyê bidne hevdû, ta ku vê derfeta zérin ji dest xwe bermedin, û karibin xwe ji bin koleti û zordarya bi sedê salan rîzgar bikin. Ji bili yekîtiyê û rakirina nakokyân ji, divabe Kurd di vê bûyera Şûrî de leystikvanin konevan û zanebin, û helwêst û brçewendiyen her dewletekî di vî Şerê pir hesas de baş nas bikin, angò divabe em zanibin ku Rûsyâ li Şûrîyê dewleteke yekbûyi yan federal, lê di bin deslatdarya kesin ku berçewendiyen wê biparêze. Amerika ji dixwaze ku kesin dijitya Israîl nekin li ser kursiya serokati Şûrîye paşeroj cih bigrin, Iranê ji bi rola xwe dixwaze Şûrî yekbûyi di bin destê rijêm de be, angò naixwaze Şûrîye yekbûyi di bin destê kesin Misilmanen Sîni de istatik bibe, lê Tirkîye ya ku bûye sedema hemû êş û azryê mîletê Şûrîyê û tevaha Ewrupa û Rojhilata Navin ji, ew ji Şûrîye di bi destê dindarên Ixwanan de dixwaze, û vê re ji dijitiya maftûr Kurdan bike, vêca diyar e ku herdem armanca Bûteflîqa û van dewletên herêmi û Şofînizm, bînpêkirina mafê Kurda ye, divabe ji Kurd vê yekê baş zanibin.

Guhertina Navan..Ta Ku «Elşîmal» Kete Şûna «Kurdistan»



Raid Mihemed

**“Lê di dema dawî
de li Rojavayê
Kurdistan ku bi
ber Fidralîzimê
de diçe, metirsî ew
e ku peyva “Elşî-
mal” tê nûjenkirin
bi destewajeya “Şi-
mal Şûrîya” ango
Bakurî Şûrîya û divê
Rewşenbîr û siyaset-
medar haya wan ji vê
yekê hebe”**

nav û peyva “Elşîmal” belav bû, bi taybetî mebest jê bû Başûrê Kurdistanê (Herêma Kurdistan) ta ku ev peyv gîhişte astekê ku dema yekî kurd bi vê peyvê dibîhize, hestê wî bilind dibû ku ev nîşana welatê wî ye, angò em dikarin bêjîn peyva “Şîmal” belgeke ser navê Kurdistan, ku dijiminê kurdan bi teybeji Rêjîmîn desthilatdar ku Kurdistan dikeve nav dagirkirîya wan (Ereb - Faris - Tirk) navê bes û parçeyê welatê me gorî rexen cugrafi dibêjîn, li İraqê û Şûrîya dibêjîne deverê kurdî (Elşîmal), wate bi kurdî Bakur û li wiha ev peyv kete di nav wêjeya siyasi ya partyen kurdî de ta ku di nav mîletê kurd de bi xwe

kete dewsa navê Kurdistan û pîşerîn bû, lê kesê rewşenbîr û ronakbîr haya wan baş ji vê yekê hebû û dijî belavkirina wê bûn, ta ku helbestvanê navdar Mehîmûd Dêwîş di dîwana xwe de ya bi navê “Lêborînê Ji Kiryaren Te Kirî Nexwaze” tê de helbestek diyarî nîvîskarê navdar Selim Berkat kir û tê de dibêjê:

“Bakur ew Başûr û Rojhilat Rojavaye di Leylanê de “niha helbestvanê ku ew bi xwe nêzî kurdan e û palpiştiya doza kurdî dike wiha dide xuyakirin, başûrê kurdistsnê ku heya vê gavê gelek nejadperesten Ereb û Faris û Tirk navê wê dîkin Bakurê İraqê û bîhtîr ji Ereban tê bikaranî peyva Elşîmal, lê pişti şerê İraqê sala 2003an û ketina Bexdayê di ragihandinê de peyva “Elşîmal” kêm bû û peyva “Herêma Kurdistsn” yan Kurdistana İraqê kete dewsa wê de, bi taybetî di ragihandinê Erebî de û ev pir sîd jê hebû, lê di dema dawî de li Rojavayê Kurdistan ku bi ber Fidralîzimê de diçe, metirsî ew e ku peyva “Elşîmal” tê nûjenkirin bi destewajeya “Şîmal Şûrîya” ango Bakurî Şûrîya û divê Rewşenbîr û siyasetmedar haya wan ji vê yekê hebe...”

Pûtekar û Şêwekar Munîr Şêxê: Berî Ku Insan Fêrî Axaftinê Bibe, Fêrî Şêwekarîyê Bûye.



- Yê ku di asta herî bilind de navdar bû, ew Fatih Al-muderis bû, ew jî diya wî Kurd bû, xwe jî Kurd didît.
- Ez Beşar Îsa wek "Qublenameya" xwe dibînim.
- Di nav Kurdan de, û di ber vê gotina xwe de berpirs im: Rexnevaneke hunera şêwekarîyê tune ye!
- Hunera şêwekarîyê hunera yekem e, zaniyan ev huner xistine pila yekem de, wek çawa sînema bûye hunera زان.
- Şêwekarê navdar Omer Hemdî "Malva" hunera şêwekarîyê nexwendiye.

Hevpeyvîn: Ehmed Bavê Alan

Şêwekar Munîr Şêxê ji bajarı Dirbêsiyê ye, di sala 1974an de hatiye jiyanê, xwendina xwe ya amadeyî û duyayî li bajarê Dirbêsiyê bûrandiye, paşê li Şamê di sala 2001an de, xwendina xwe ya zanîngehê besê Huner (Endezîyariya Dîkör) qedandiye. Li Şamê jî bûye endamê sandîkeya hunermendê Sûriyê, xwendina xwe ya bilind jî bijart lê bi dawî nekiyire.

* Di kijan salên jiyanâ xwe de hûn pêrgî kêşeya Kurdi hatin, û we xwe nas kir ku mîletê me yê Kurd xwedî ziman û dîrok e, û di bin nîrê dijmîn de dijî?

Caxa ku min di pirtükîn réjîma Be'sa Sûriyê de dixwend: "Isra'îl dagîrkerê zemîna Erebâ ye"! wî heyamî min ji xwe re digot: Pêwîst e em li şûna wê bînvisin: "Ereb dagîrkerê zemîna Kurdistanê ne" ew jî di sala 1987-1989an de bû, hişmendiya me li ser pirsa me ya Kurdi ji xwendina gelek pirtükân giha hev, û civaka me jî li bajarê me ji bo doza Kurdi cîvakek berxwedî û tekoşer bû.

* Di despêkê de we cawe xwe nas kir ku hûn dikarin afrandinê bikin, kîjan sal bû, û we berê xwe da ci? "Wêje, Mûzik, şêwekarî, huner"?

Caxa ku min pêñûs û pel û dibistan dîtin, ew jî di pola yekê de bû, min xwe nas kir ku ez dizanîm şêwekarîyê bikim, anku dîmenan çêbikim, rûyê naskirî jî çêbikim. Yekem tabloya bi rengan min çêkir ez di pola pêncan de bûm.

* Kê piştgiriya Munîr Şêxê ji bo berdewamiya şêwekarîyê kir?

Wek ku min di serî de diyar kir, bajarê min di rojavayê Kurdistan de navdardîrîn bajar e, ku ewqas kes mijûlî siyasetê ne, lê ew bajar bêtir bi şêwekarî u nivîskarîn xwe yên navdar hetanî li ser asta gerdûnî naskirî ye. Mînak Beşar Îsa wek rewşenbir, siyasetmedar, û helbet wek şêwekarî navdar jî, min ji xwe re ew bek nîmûne didit, ku riya wî bîşopînim, anîha ez wî wek "Qublenameya" xwe dibînim. Helbet jîbir nakim yên ku moralê min bilind kirin mamostê min yên dibistanê bûn, ewan jî piştgiriya min kirin. Destpêkê malbat ne alîkar bû, lê vê dawiyê bi xurî alîkariya min kirin.

* Di despêka xwe de we hin pêşengeh vekirin?

Yekem pêşengeha fermî ku min wek şêwekarî vevir di sala 1991ê de bû, min tê de 14 tabloyen bi rengê avî dalîqandin.

* Berî xwendina te ya akadîmî, we kengî dibistanê şêwekarîyê nas kirin?

Di pola 12an de, mamosteyek ji parêzgeha Humîse hatibû bajarê me, ew derçêyî kolêja hunerên xweşik bû. Min di riya wî re her tişt nas kir, ku zanîngehê hene, û mirov dikare bi şêweyek zanîsti vê xwendinê berdewam bike. Min nas kir ku ewqas dibistanê şêwekarîyê hene, û ewqas besê hilbijartina xwendinê jî di zanîngehê de hene, di nav wan de jî besê dîkor ku smin bijart ji bo bixwînim. Min Liyôrdo Davinşî di

pola 7an de nas kir, her wisa min berdewam jî kir.

* Giringiya şêwekarîyê di jiyanâ gelan de ci ye?

Huner bi gişî, ger mirov bêje pir giring û pêwîst e, û hunera şêwekarî piy ked û sal û mijûlkirin jê re dive, hetanî ku karibe xwe bavje qada navdaryê. Hin tablo têن çêkirin, bi pereyên gelek tên firotin, lê nayê wê watayê ku ew navdar bû. Ez dibînim ku kesek nabe navdar eger ew ne li ser bingehêk saxlem hatibe avakirin, yên navdar bûne, bingeha wan jî saxlem e.

* Navdartîrin dibistanê şêwekarîyê kîjan in?

Bi dehan dibistan hatine afîradin, merov dikare bêje wek dibistan: Kilasîk, intiba'i, te'bîrî, remzî, kilasîkiya nûjenkirî, û dibistanen ku piştî (تغیریة، تحریدیة، اتفاقیة) derketine, evan dibistanan xwe li ser asta gerdûnî dan nasîn, min bi xwe kilasîk û (وقوعة و الواقعية المرمزية) çêkiriye.

Dibistana hunera kîlasîk temenê wê 2000 sal in. di jiyanâ min de du salan ma hetanî min karibû bibim pispor di vê dibistanê de. Lê ya ku ez pir ketim bin bandora wê de, ya (bû, stûna wê ya herî navdar jî Van Cox e.

* Şêwekarê Kurd yêni ji Rojavayê Kurdistanê ci dibistan hilbijartine?

Cîma dibêjîm (تغیری) ew dibistana ya herî mezin e, di nav dibistanen şêwekarîyê de, di nav Kurdan de yên ku li ser dibistana kîlasîk kar bikin tune ne, yên ku (انطباعی) dişuxulin yek-dido ne, yên ku (جرب) kar dikin pir in, piraniya şêwekarîn Kurd li ser te'bîrî kar dikin, di nav wan de navan mezin wek: Beşar Îsa, Berhem Haco, Inayet Etar, Zuhêr Hesip.

* Pirsgirêk heye ku şêwekarî Kurd ji berê de koçber dibe, gelo ew sedem ci ne(civak alîkariya wî nake)?

Dibe ku di bin mejiyê wan de hebû ku ev welat û ev civak ne cihê afrandina vê hunerê ye, sedemên serekî jî hebûnê re sedemên siyasi bûn, piraniya şêwekarîn Kurd bi siyasetê mijûl dibûn, dibe ku ewan dixwestin herin cihê koka vê hunerê, jîber ev huner hunerek nû hatiyê li ser Rojhilata Navîn ne li vir ariş ye!


* Gelo sedema ne pêşketina şêwekar li Rojhilata Navîn tê wê wateyê ku rexnekirin û nirixandin di astek nizim de ye, û di nav Kurdan de peyda dibe gelo?

Hebûna rexnevan û tunebûna wî ji yê şêwekar re ne pirşirêk e, jîber ku ew dikare xwe li pêş bixe, dîtina wî jî afrandîne re wê serkefti dike, şêwekarê ku rexnevaneke wî li pêş bixe, ew bi pêdiviya kedîkirin ye, hunermendê zîrek ew e yê ku bi xwe re dikave pêşbirkê! rexnevan dikare ji cîvakê re roleke bas bîlize, lê di şêwekarîyê de ew nikare rolleke pêşkefti bîlize. Ez perpirsim diber vê gotina xwe de, di nav Kurdan de rexnevaneke

hunera şêwekarîyê tune ye!

* Çaxa ku kûn pêşengehekî ji tabloyan vekin, hûn çiqası dikarin ji temaşevanen xwe re tabloyan şirove bikin?

Danû standina bi tabloyê re sinorê sam karînê derbas kîrye, girtin û ne tamkirina tabloyê civak zehmetiyê dikşîne, hunermend vêrolênalize, û ne jî rexnevan, wisa diwarek ji tirsê di nav bera temaşevan û tabloyê de çedîbe, li tabloyê dinerin jê ditîrsin. Em ê cawe vî diwarê bîherfinin mijarek mezin e, û projak mezin jê



re dive!!

* Diyar dibe ku şêwekarîn Kurd ji wek hemû nivîskar û helbestvanan hûn ne li ser hevin?

Ji bo pêşketina kareki hevbes, pêwîste ku ew kar rêxistinkirî be, eger peyda bû, em dikarin berê gelê xwe bidîn vê hunerê. Saziyî fermîne ne, mixabin! hemû karên ku dibin karine tekane û kesayetî ne, şêwekarê Kurd kar û berhemên hev dişopînin, û têkili hene û nayen birin.

* Hejmara şêwekarîn Kurd yêni ji Rojavayê Kurdistanê cendin?

Ez dikarin bibêjîm ku, 60 hunermend hene, û ji wan 20 hunermend hene ku diastekke heri bilindde tabloyen xwe çedîkin, di nav wan 20 hunermend de 5 hunermend hene ku li ser asta gerdûnî navdar bûne.

* Gelo em dikarin bibêjîn ku hunermendê şêwekar rewşenbir e?

Karê ku hunermendê şêwekar dike, dikeve dîmenê rewşenbirîye de, ci tişta ku were afrandin ew rewşenbirî ye, gelo çiqası ew afşandin xweşik û bedewe, di wirde diyar dibe ku rewşenbirî ye yan na! Lê hunermendê şêwekar karê xwe yê nivîsin jî dike, û pirtûk û gotaran jî li ser huner û tabloyan diafrîn. Ü ew şêwekar navdar yên ku pêñûsa wan jî bilind e pir in. Lê ya giring ew e ku yê şêwekar pêşî tabloyeke serkefti çêbik, paşê nivîsandinê bike, di vê mijarek de ev nerîna min e.

* Piroje li rex we hene ku hûn di Rojavayê Kurdistanê de rîbazeke fermî ji bo hunera şêwekarîyê de ci ne?

Pirtûk min bi navê (الفن والمخطوطة) heye, û pirtûk din jî heye bi navê (قيم الجمالية في العمارة العثمانية) ew destnîvis in, di demek nêz de tên çapkirin.

* Em dixwazin li ser hunera karîkatorê hinekî baxivin, Kurd

perwerde bikin û wî fêri vê hunerê bikin, piroje hatin pêşkêkirin, wek avahî û rêxistina bajaran, ji bo şaradîrian, rîbazan zarokan, lê kesek li wan pirojeyan miqate nebû..! Ew jî cîma lê miqate nebûn, nenaskirina vîbesêdiyîyanagelîme de. Vê hunerê giring nabînin! Eger yê rîvebir giringiya vî henerî nas bikin, wê derfetê bidin.

* Pûtekarî Kurd li Kobanî danîn, û pûtekarî wê ne ji Kurdê rojava bû, cîma hûn van karan nakin?

Di rojeva huner de, eger tiştekî baş bihata çekirin, xewdî bike kuji Fenzoyla bana, ji bo Kobanîye (نصب تذکاري) giring bû, ne ev pûteye ku jê re hati çekirin. Em li ser projekeyi ji bo Kobanîye axivî bûn, berî vê projeya seqet, seqete di aliye hunerî de di aliye sembolik de, di aliye cih û metiriyal de jî. Em insanin xwe ji xwin û laş û hestî jîbir dikin, û em diçin jîneke evsane ji jînen "Ixriq" tînin, û li Kobanîye wê bi cih dikin, û em Aran Mirkan jîbir dikin, ya ku sinorê evsaneyan jî derbas kiribû. Eger ew pûte li Kobanî, li Paris bihatadanîn, wê hunermendê wê pêve bihata bidarvekirin, û yê ku bîriyra danîna wî jî daye. Pêwîst e ku em şîyar bin ji bo kareki din wisa neyê çekirin! Ew pûte nayiqê jîna Kurd û berxwedana Kobanê ye.

Ne bajarê Amûdê ye ku ew pût lê were danîn, Amûdê bajarê şoreş û rewşenbiran, bajarê sinemeyê, û şewata nîşekîye. Di cihî wî pûti de, berê heykelê Esed bû, wek huner ew heykelê Esed serkeftûr bû ji pûte jîna ku niha li Amûdê danîne, helbet ew heykel di aliye xwe yê hunerê de saxlem bû, lê ji insanekî diktator û nesakîn re hatibû çekirin. Ew pûte jî nayiqê Amûdê û jîna Kurd û Rojavayê Kurdistanê ye. Pêwîst e rîvebir haydar bin ji bo van pirsîrîken mezin.

* Eger ji we hat xwestin ku hûn pûteyi çebikin, hûnê ji kêt re çebikin?

Berî her tişti ez û pêşbirkeke çebikim, û re komîtekê jî deynim, ez jî wek hemû hunermend tîk-evin pêşbirkê, û hemû kar wê herin komîta nirixandin û erêkirinê. Ji kêt re ez û pût çebikim helbet wê jîn be, jîna Kurd.

* We cend pêşengeh hetanî vê çaxê lidar xistine, û li ku ew vebûn?

Wek min got pêşengeha min a yekem di sala 1991ê de bû, pişti re pêşengehê hevbes me geleke lidas xistine, Li Dirbêsiyê, Şam, Qamîşlo, Siwêrsa, Amed, di sala 1996an de, min pêşengeha karîkator ya taybet çekir.

* Xelatîn ku şêwekar Munîr Şêxê wergirtine?

Xelata yekem a biratiya gelan ya Bexdê bû, ew ji navden Mezopotamîyê bû, min ew xelat diyarî wezîrê çand û huner yê Kobanîye kir.

* Nivîsandinê we di warê hunera şêwekarîyê de ci ne?

Pirtûk min bi navê (الفن والمخطوطة) heye, û pirtûk din jî heye bi navê (قيم الجمالية في العمارة العثمانية) ew destnîvis in, di demek nêz de tên çapkirin.

* Em dixwazin li ser hunera karîkatorê hinekî baxivin, Kurd

* Gelo bi we re bûriye ku şêwekarî Kurd sirûşa tablova xwe ji helbet yan jî destaneke Kurdî bîriye?

Bûye, gelek cara tablo bûye helbest, roman bûye tablo. Dibe û merov dikar hîna jî li ser kar bike, Xecê û Siyamend dibe tablo jî û dibe opira jî. Ew tişt dibe, û di nav hemû şêwekarîn duniyatê çebûye.

* Di despêka şoresa Sûriyê, we pişta xwe da sûriyê û heremên xwe û hûn koçber bûn, cîma niha Munîr Şêxê vegiriyate?

Götina me pişta xwe da vir û em çün eger ez şirove bikim ez wîisa bîbîjîm, di despêka şoresê de me gelek danû standin bi hemû aliyeñ siyasîreçekirin, mejîwanregotgerenek Kurd xwedî helwestê taybet bin jî vê şoreş, anku em bi reng û dengê xwe dakevin xwepêşendanan. Em ne wek partîyan diramîyan, niha diyar dibe ku helwesta me di hindek ci de şas çû, û ya wan jî di hindek ci de şas çû! Ez li Şamê bûm daktekim heremâna xwe, me hînek pirojê girêdayîçand û henerê kirin, jîber xwesîna leşkerî ya rîjîm neçar mam ku ez ji Sûriyê derkevin, lê neçûm dûr li Bakurê Kurdistanê nişteci bûm, niha hatime li Rojavayê Kurdistan bîmînim.

* Em li ser piroja we ya lidarxistina kongirê "HRRK" li Rojava baxivin?

Ew ji aliye rewşenbirîn welêt yê li derive di germâhiya serhildana 2004an hate damezrandin, pişti lidarxistina kongera çaremîn ê Hevgirtina Rewşenbirê Rojavayê Kurdistanê, bîriyar hat standin ku şaxê xwe li welêt vekin, ji bo vegera welêt, konîfransê Amedê çebû, û şaxê wê hat avakirin, pişti wê şaxê Silêmaniye jî hat avakirin, niha jî li gor briyare wê kongireya pêncemîn li Rojavayê Kurdistanê were lidarxistin, û helbet li gor briyare wê Rojava bibe navenda fermî, û wê Ewrupa, Amed, Silêmaniye bibin şax, komîtek ji bo rîvebirîna vî kongirî destnîşan bûye, di demke nêz de tên çapkirin.

* Em dixwazin li ser hunera karîkatorê hinekî baxivin, Kurd

Çareserî makezagon e

Ji bo her miletkî dewlet mebesta heri piroz e, dema ku mirov çavê xwe ve dinik li ser netewa xwe heydarî ciyawaziya xwe ji komeleyen din dibin, hewl didin da bibin xwedi statoya siyasi, alav û helûmecen ji ber vê yekê dipelinin peyda dikan, nimûne miletê kurd û ku bi dehê salan di tekoşina avakirina welatê xwe Kuardistan de berdewam e di riwê wan hêzê ku hebûna xwe weke dewlet li ser êş û sitemkariyê çê kirine, xaka mileta dagir kirine, mafêwan çewisandine, nabîn ku ew hêjayî ne da jyanke aram bijîn, lewma hebûna miletê kurd di vê cuixrafiya giring de rasti êriş û pevcûn û dagirkirinê hatiye.

gelek beryen Şera li ser xaka kurdistan qewimîne, vekirina vê mijarê ne ji bo pesindanê ye ne ji jib o zanyariya ye, lê ji bo nejîbirnekirinê û li ser avakirinê ye da ku azmûnen me kurda cihê paldanê bin.

paşeroj ser ava bibe -îro paşî sed sali ji pêkanina rêkeftina Saykia Piko a ku sinorê xuza ê Kurdistanê nebedi kir mafê gelê me daqurtand ew perçê kir çarenûsa miletê kurd radesti sêwiyen dewleta Osmani dikir û paşî hemi rûdan û guhertinê di van pênc salên dawî de çêbûyi û penaberi û bobelatê hati serê miletê herêmeli li Sûriyê û Iraqê bi teybeti û armancikirina hemi netew û tireyan ji hêla mirên Şer yên Radikal û tundrewan û paşî ku réjim û rikberiya Sûri li mafê



Zahid Xelef

bigihîn ku:

1-kiriza Sûriyê nemaye girêdayî daxwaza miletê Sûriyê û herwiha Iraq û tevahiya dewletên di nav sinorê Saykis Piko de belav bûne ji ber ku sinorê vê rekeftinê hetine parastin bi zagonê netewen yekbûyi hilandina wan iro ne diyar e, zehmet e û herifandin ne ji xwe ve ye. 2 - Ew hêzên ku ev rekeftin darianzin Beritanya û Ferensa bûn iro ne weke wê demê di guhertina de bi bandor û rol in, ji ber Emerîkan û Rûs û hinek ji dewletê herêmê ji asteng in, guhertina napejirênin

3- Tişteki xuyaye ku guhertin wê di riya Makezagonen van dewletan be, bi Şêwiyê ku her pêkhatek xwe bibine xwedi hebûn, bi yasayen ku wê bén danin parasti ye, paş lihevkinê neştimanî.

4- Rastiya baş ew e divabe em zanibin ku ev hêzén mezin û ku bûyeran di gerin wê guhertinan weke berjewendiyen xwe nexşê bikin ne weke daxwaza me lewma tê xwestin em kar bikin li ser guhertina makezagonan da ku mafê me bê çesipandin bi riyan yasayı li vê derê û ji ber ku rewş ne zelal e ji tevgera kurdî tê xwestin ku amade be bo hemi egeran heger Şerê navxweyî dirêj bike.

Henê Keşe li serê girê gund dirûnişt û tivinga wî di destê wî de bû, dema ku rôbwar di wan rêyan re diçün Henê Keşe gule tavêtin wan û digot: Ka gule di wan de diçin yan na? gelo mirovin hene ku gule di laşê wan naçe!?

Dema mirov biketa hewşekê ji hewşê Fila, mirov dikaribû ji wê hewşê li tevahiya hewşen gund bigerya, malen wan wek bajare mişkan bû, tev bi hev ve girêdayî bûn, xuya ye ji Fermanê tirsiyabûn ji lewma xanî tev bi hev ve bi wî rengî girêda bûn

Li ku dikeve?

Gundê Kanî Kerkê bi qasi 2 Kilometrîn li Rojhilatî Dêrika Hemko dikeve. Gund yê mala Heci Zorav e. Wek ku tê gotin ev gund ji pênsed sali û bi Şûn de hatiye avakirin, dema ku Kanî Kerik hati avakirin, wê demê Kurdistan du parçê bû, yek di bin destê Farisiyan de bû, û parçê di di bin destê Osmaniyan de bû.

Mala Heci Zorav wê demê li Cizîra Botan bûn, lê pişti Osmaniya ferma Xeristaniyan rakir û Xeristyan ji mirinê revyan, Heci Zorav gundê xwe sipartê mala Henê Keşe û ew bûne muxtarê Kanî Kerikê, di wê demê de Xeristaniya ji xwe re hin gundê dî li wê derdorê ava kîrin û ta roja iro, hîn çend gundê wan li



Luqman Silêman

wê deverê hene.

Henê Keşe kî bû?

Dibêjin pişti ku mala Heci Zorav ev gund sipartin Henê Keşe, hilanî û danîna gund kete destê wî de ta ku Ferensa hate Sûri û ev sinorê iro di navbera Sûri û Tirkî de hate danin, mala Heci Zorav dikarin werin Sûri, Henê Keşe gund li ser navê xwe danî û ew bû xwediyê gund, wek tê gotin Henê Keşe bê brexti li Heci Zorav kiriye?

Dibêjin Henê Keşe miroveki zalim bû yek ji wê zilma ku wi bi serê Kurdan de dikir ev bû:

Henê Keşe li serê girê gund dirûnişt û tivinga wî di destê wî de bû, dema ku rôbwar di wan rêyan re diçün Henê Keşe gule tavêtin wan û digot: Ka gule di wan de diçin yan na? gelo mirovin hene ku gule di laşê wan naçe!?

Dema mirov biketa hewşekê ji hewşê Fila, mirov dikaribû ji wê hewşê li tevahiya hewşen gund

bigerya, malen wan wek bajare mişkan bû, tev bi hev ve girêdayî bûn, xuya ye ji Fermanê tirsiyabûn ji lewma xanî tev bi hev ve bi wî rengî girêda bûn, lê ez bawer im ku iro kes ji wan di gund de nemaye, hemiyan bar kirine û çûne bajaran, lê hîn erdê wan li gund heye.

Li hêla Rojhilatê gundê Kanî Kerikê gundê Hekemiyê û gundê Girka Miro hene. Li hêla BaŞûre gundê Kanî Kerikê gundê MameŞûra piçûk û ya mezin û Girê Kera hene. Gundê Girê Kera yê Xiristiyanâ bû. Li hêla Rojava bajarê Dêrika Hemko û gundê Borizê ne.

Wekî dî hin Kanî li derdorê gund hene ew ji ev in: Kanî Hejir, Kaniya Jina, Kaniya Mera, Kanî Mirçan, Hejîrok, Kanî Xiramok. Girê Dimsê, Girê Hisen, Girê Mehmed. Qelaçê Dêrê, Qelaçê Ziyaretê, Qelaçê Seyd Abs, Qelaçê Qoçikê, Kavîlê Şêx Omer "lê kes ji gundiya Şêx Omer nedîtiye û nizanin ev Şêx ki ye yan ji ku derê ye", Çemê Kanî Hejirê, Çemê Kanî Mirçanê, Çemê Girkê Hisen. Gundê Kanî Kerkê heftê û Şeş mal tê de ne û çarsed û heşti mirov in (Li gor sala 2006)an, ji wan 86 malan, 30 mal bê nasname ne, û 134 mirov ji 480, ew ji bê nasname ne, dora 60 xorti li gund hene, û 76 keç ji hene.

Têbin: Wek ku nivîskar di nivîsa xwe de diyar kiriye ku ev nivîs di sala 2006an de hatiye nivisanidn.

Tekin ÇIFÇİ

Dengbêj û Hunera Dengbêjiyê Di Çanda Kurdan de



Eyşe Şan

destanên kurdî ji ber xwe ve dibêjin re, li BaŞûre Kurdistanê "helbestvan", li Bakurê Kurdistanê ji "dengbêj" dibêjin.[8] Li gor yek nivîskarê navdar yên kurdan Mehmet Uzun peyva dengbêj ji du peyvan, deng û bêj pêk tê. Dengbêj kesê ku deng û peyvê dibêje ye, hostayê deng e. Ji bo dengbêjê navdar Evdalê Zeynikê weha jî dibêje: "Evdalê Zeynikê him herêmî bû, him jî gerdûnî bû. Ji ber ku tiştên ku digotin, vegotina wî herêmî û xweser bû. Qala hes-tên xwe û mirovên xwe dikir. Lê belê qala her kesî dikir. Ji xwe ya girîng jî ne ev e? Tu yê xwe vebêjî lê her kes wê xwe tê de bibîne.[9]

Di rewseke weha de folklor a kurdî anegorî çanda devkî, bi taybeti muzika kurdî, di saz-kirina nasnameya kurdî ya ni-jadî de xwediye roleke sereke ye. Jiyana kurdan, guherînên civakî, di zaravayê cihê de, bi awayekî domdar ji nifşekî gihaye nifşekî din. Lehengî, qewimîn, kevneşopî, rê û rism,

destan, çîrok û hwd. bi awayekî rêk û pêk bi strankî hatine hon-andin û bîreke hevpar ya ci-vakî hatiye sazkirin. Tengbûna qada edebiyata nivîskî rî li ber çanda devkî fireh kiriye.[10] Di gihadina berhemên çanda devkî ya heta iro de para mezin ya dengbêjan e. Berhemên çanda devkî gelekî cihêreng in. Hema bêje her tişt bûye mijara çanda devkî. Şer, evîn, koç, ji-yana rojane, mîr, beg, jin, bûk û hwd.[11] Di çanda devkî de bandora jiyana koçeriye jî gelek e. Hema bêje di her stranê de pesindana zozan, deştan, çi-yayan, newalan heye. Şibandin bi sewalan û fêkiyan tê kîrin. Wekî mînak: Çav reş û mezin in wekî yê xezalan in; bejin dirêj û zirav e, wekî takî rihanê ye; sing û ber hênik û sîpi ne wekî berfa zozan, çi-yayan û hwd.

Heger em vegerin der mijara xwe, li Kurdistanê tu dibistana dengbêjiyê tune ye. Lê belê hin dildarê dengbêjiyê çûne mala dengbêjan û carinan bi mehan li mala wan mane. Bi vî rengî, li ba wan hostayê kilaman hînî kilam û qâideyên dengbêjiyê bûne. Li aliye din ve amûren teknikî yên wekî sêlik, band, televîzyon, radyo, kompîter û hwd. derfeta belavbûna dengê dengbêjan di din destê me.

[1]Ferhenga Kurdî-Tirkî, amd. Zana Farqînî, weş. Enstituya Kurdî ya Stenbolê, 2004, r.461.

[2]Ferhenga tirkî-tirkî, amd. Sebahattin Özafşar, weş. Tomurcuk, Stenbol, 2012, r.401.

[3]Mehdi Mutlu, "Reso û Zi-manê Kurdi", Panela Bîranî-

na Dengbêj Reso, Turizm İl Müdürlüğü, 29 Gulân 2012, Muş.

[4]Abdullah Kiran, "Di Dengbêjiya Kurdî de Rola Reso", Panela Bîranîna Dengbêj Reso, Turizm İl Müdürlüğü, 29 Gulân 2012, Muş.

[5]Ahmed Aras, "Kilama Kurdî û Dengbêjiya Serhedê", Bîr, j. 7, www.kovarabir.com, 12.12.2011.

[6]Kendal Nezan, Kürt Müziği, wer. Necdet Hasgül, weş. Avesta, Stenbol, 1994, r. 12-13.

[7]Erol Mutlu, "Kürt Müziği Üzerine", weş. Avesta, Stenbol, 1996, r. 55.

[8]W. Jwaideh, Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi, wer. İsmail Ekem û Alper Duman, weş. İletişim, Stenbol 1999, r. 47.

[9]Mehmed Uzun, Dengbêjlerim, weş. İthaki, Stenbol, 2006, r. 44.

[10]Nezan Newzat Çelebi û nd., "Geleneksel Kürt Müziğine Genel Bir Bakış", www.daplatform.com/news.php?nid=25. 01Berfanbar 2011.

[11]H.b. r. 3.

[12]Abdullah Kiran, "Di Dengbêjiya Kurdî de Rola Reso", Panela Bîranîna Dengbêj Reso, Turizm İl Müdürlüğü, 29 Gulân 2012, Muş.

[13]Hilmî Akyol, Antolojiya Dengbêjan 1, Edit: Azad Zal, weş. Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê, ç.2, 2011, r.136.

[14]Eyşe Şan, Heywax Dayê, mp3.

Helbestin Bijartî “Ehmedê Huseynî”

DENG

Dengek tê guhê min..

Her şev
Her kêtik
Tişteki dibêje
Lê nizanim çi ye?
Pencereyên xewnê digirim..
Ü xwe li hêviya
Semageriya agirê
xetîreyen azadiye
Radigirim..
03.11.2015

Wek nehwirîneke serberdayî
Wek mirineke derengmayî
Bibarim...!
11.11.2015

QULING

Yê ku di dilê te de dijene
Ez im..
Yê ku li vir û li wir
Û li ser milê te
Bi bagerê re dikene
Ez im..
Dîsa jî
Qulingê li ber çavê te
Per şkestî
Bê war û bê cî
Pelekî ji darê ketî
Ez im...!
11.11.2015

JANÊ XELEF

Ji te re nabêjim
Bêrkirinê
Çavlîrêmanê
Dilê parçebûyî yê aşiqan
ji te re nabêjim..
sorgulê bêriya destê te kiriye
Azadiye bêriya çavê te kiriye
Üjîyanêjîbêriya kenê te kiriye...!

BAGER

Bager..
Bi daran re dipeivey
Reşemarek hildiperike qurmê
darê
Siwarek
Şopa hespê xwe wenda dike
Ez jî şopa kenê te
Dirêçêndilê xwe de nîgar dikim..

MIRIN

Li cihekî pîremêrek dimire..
Li cihekî din zarokek..
Di nav destê min de xewn
Û li ber çavê min
Evîna te!!
04.11.2015

BAJAR

Vê şevê
Bajaren te
Bi pêxemberên derewîn
hatine dorpêç kirin..
Peyvînpîrozlikolanan diherikin,
Bi dizî ji xwe re dibêjim:
Bêriya te dikim şaro!
Bi destê xwe keroşkên tirsê
dikim..
Şev dilerize,
Piyala min dilerize,
Sîrûda jîyana min dilerize,
Û bi tenê
Li ber
Îstegeha jîyanê
Li hêviya tirêna hatina te me
Hey azadî...!
11.11.2015

DIÇİM

Diçim
Da ku têra xwe
Bi çolistanê re bipeyivim..

Diçim
Da ku di nav tozê de
Li bîrânîn xwe bigerim..

Diçim
Da ku xwîna kewan
Ji ser zimanê Amûdê
Ji ser keviya kêtelen gora diya xwe
vemalim..

Diçim
Da ku têra xwe
Di deftera evîna te de
Di bahoza birîna te de
Binalim...

Diçim
Da ku li wir
Wek şervanekî jîbîrbûyî

Ji Amedê
Hetanî bi Amûdê
Di xwînê de digevizîn
Çarenûsa min
Pêñûsa min jî

LI VIR

Li vir,
Min her tişt ji bîr kir!
Min helbest
Sirûd
Hevalên mirî
Tembînameya bavê xwe
Min evîn jî ji bîr kir...
Li vir
Bi çavê xemgîn
Li bîrânînan temaşa dikim..

Qamişlo
24.01.2016

RONDIK

Ji bîr neke
Tu gula hinarkên xwe
Bi rondikên min
av bidî!?

KEN
Nûçeyan ji min re nebêje!
Behsa welatan ji min re neke!
Gelo ez ê çawan çûkê dilê xwe
Di goristana kenê te de vesêrim?

*Di sala 1989an de
çû Swêdê. Niha jî li Îngilistanê dijî.
Gelek pirtûkên Ehmed Huseynî hatine çapkîrin.
Di sala 2002an de
Dîwana wî ji aliyê
Weşanxaneya Avestayê ve
hate çapkîrin. Di dîwana
wî de beşike mezin ji berhemên wî hene.*

BOTANÊ

Payzokên te
Xwesmîr û siwaran
Keviran
Helbest û dildaran
Bi girî vedikin
Botana minê!!!

GULL
Ew gulleya ku dihat
Û di sînga min de wenda dibû
Ji mirovan re digot:
Hin tişt hene
Şîrîn in
Û hîn jî tal in
Wek mirinê!!!

GER
Li min biggerin!
Hûn ê min,
di dilê Kurdistanê de
kuştî bibînin!!

KEÇA MIN ÈVAR

Ji esmanan ta bi erdê
Ji deştê ta bi çiyê
Ji seferê ta bi Stokholmê
Ji mirinê ta bi Londonê
Ji tenhatiyê ta bi goristana
Amûdê
Ji te hez dikim!!!

KURÊ MIN BAZYAR
Ji kîjan baranê dest bi hezkirina
te bikim?
Ji kîjan hevirî
Jîyanê li gor dilê te bisitîrinim?
Ez ê ji bo te carekê bimirim

Dîsa jî ji bo te
Ez û çayan şehîd dikevin!!!

DÜRKETIN

Ji dema ku dûrî te ketim
Jidemakujiçermêxwe derketim
Ji dema ku di bîra te de raketim
Ji dema ku hespên min

Kobanî yek ji wan çirokan e..

Li Kobanîyê
Pinpinik bi gulleyan re,
Bager bi stiranan re,
Û helbest bi keviran re ,
dipeyivin!!

TU...!

Tu demsalân min
Yeko yeko ji xaniyê xewna min
didizî!
Tu, di bêhûdeyiya rihê min de
radizî!
Tu li xetîreyen dilê min temaşa
dikî!
Û xwe ji ber tîna eşqa min
vedidizî!?

BÊRÎ

Bêrîkirina xwe bi xwe re bîne
Berbiskên xwe jî bî xwe re bîne!
Sirûdên xwe di dilê min de
Biçnê...!!
Pencereyê veke û xewnan
bibîne!
Baskên xwe veke û li bajarê min
biçurise!
Û dema ku dahola cengê dest
pê kir
Tiliyan xwe di şûna gulleyan de
Ji min re bişnê...!!

GUSTILK

Li paş wê darê
Şopa gavên te dibînim..
Li paş wê dara din
Bi kila çavê re dipeyivim..
Û li paş wî esmane dûr
Gustîlka te
Di tiliyan ewran de diçurise!!

PEL

Sosinên te li ber çavê min in
Şervanên te jî di xwîna min de
rûdinin
Erê Rojavaya minê
Li qîrînîn pelên darên giyanê te
Guhdarî dikim!!

GUL

Min gulek ji te re
Xiste guldankê
Û min ji te re got,
li vê gulî miqate be
Ev gul
gula şehîdên welatê min e..!

*Sala 2001ê de, di
Medya Tv de, bernameya
Simirê Tavşorê û ji sala
2005ê de di Roj Tv de
bernameya Dengvedana
Peyvê pêşkêş dikir.
ji destpêka sala 2013ê, di
Ronahî Tv de, bernameya
Seva Hicranê pêşkêş dike.*

STÊRK


Îşev, bi hezaran esman
di stêrkên Nisêbînê de,
Bi hezaran gorîstan
Di laşê Qamişlokê de
dixuyin!!!

EFRÎN

Li ser dergehêن êşa te
Navê din ê zeytûnê me
Li ser dergehêن ava te
Rondîkên rojê me..
Û di banga dilê te
Evîneke tîjî azadî me
Efrîna minê!!

DU BAJAR

Vê şevê
Esmanê Qamişloyê



dil û jîyana Huseynî yî..!

*Hemî berhemên
Huseynî (15e berhemên
ku ji helbest û pexşan û
rexne û lêkolînan pêk
tê), yên çapbûyî yê
li ber çapê, li Amedê, li
weşanxaneya Aramê, di
sala 2016an de, di du
cildan de, hatine çapki-
rin.*

BENDEWARÎ

Di guhên min de
Xuşîna reşekirasê şeva
Qamişloyê,
Di hestên min de,
Kurtepista bageran û darbestên
rengîn,
Di çavê min de,
Ronahiya te
Ginijîna te
Krîstalên destê te
Hîva xemgîn a li ser zimanê te
Û di dilê min de jî
Bendergehêن şewîtî
Melevanîn şkestî
Rêwiyêner sergerdan
Pêlvedanên bêzariyê
Qublenameyên ji meyê
Û helbestên navê te
Navê te yê ji bendewariy়!!
Navê te yê ji çavkaniyan!!
18.06.2016

BÎN

Bîna kavilan ji porê te tê
Bîna komkjîyan ji destê te tê
Bîna qonaxê ji gavên te tê
Bîna hesretê ji zimanê te tê
Bîna darbestê ji milên te tê
Bîna sînoran ji zikê te tê
Bîna tarîstanê ji çavê te tê
Bîna dayîka min ji kirasê te tê
Bîna birînan ji bîra te tê
Bîna dastanan ji tiliyan te tê
Bîna xatirxwestinê ji hinarkên
te tê

Bîna aşiqan ji hinaseyên te tê
Bîna sorgulan ji xwîna te tê
Bîna rîhanê ji berbiskên te tê
Bîna lavijan ji lêvên te tê
Bîna welatan ji xwêdâna te tê
Bîna xwedawendanji dîlanata tetê
Bîna sînoran ji çîrokên te tê
Bîna tîrêjîn rojê ji gerdena te tê
Û bîna te jî
Lê lê Selmayê
ji dilê min tê!!
19.06.2016

TENÊ

Her roj darekê, bi navê te, di dilê
Qamişloyê de diçinim..
Her roj, ewrekî ji refê xwe mayî,
ber bi warêne te ve dişinim..
Her roj, li ser ala şervan, kenê
te dînîşinim..
Her roj, tu dibî azadî, ez jî bi tenê
dimînim!!
14. 06.2016


DIL

wek ku tu çawan serê xwe ji
rastiyê re dihejînî,
Wisa jî dilê xwe ji evîna min re
bihejîne!!
15.06. 2016

TU

Tu ximav û pêñûsa destê Xanî yî
Tu kevalûreng û neqşeya Manî yî
Tu hinaseyâ Selmayâ Cizîr yî
Tu av û rûbarêne şewata Feqî yî
Tu Yelda yî, şevçiraya çavê Nalî yî
Tu Rojavaya min î,

Dema Ku Bendewarî Kuje Be

MINER
2016

Pendên Kurdî

-Rovî ne diçû qulê hejkek bi terya xwe vekir.
-Rîya ker zivistanî tê de bikeve havînî nema tê re tê.
-Yê Şemîtî mal Şewitî.
-Ê jina xwe berde li çîmê sipî napirse.
-Ê ne ke ji a mezina qulocê wî dîbin ê bizina .
-Gîya di bin kevra de namîne.
-Ji pîreka re zêr û ji zilama re Şûr.
-ji tiral re gotin kulor baryan go çi fêde nakevin devê mi .

mamik

- Çûme bistaneke..hemû bûkên salekî.
- Canê wî goşt e, kincê wî derzî ne.
- Qesra maliştî, du feqe têda rûniştî.

Bersiva 45an: Perikén çıxaran- stêrk- Kew

Çirokên Gelêri yêñ Kurdan" Derket



Çirokên gelêri yêñ herêma Semsûr û Rihayê di pirtükê bi navê "Çirokên Gelêri yêñ Kurdan" de hatin berhevkirin.

Enstituya Kurdi ya Stenbolê ku yek ji xebata wan ji berhevkirin û tomarkirina çanda gelêri ye, di vê çarçoveyê de gavek din avetiye û pirtükê din a ji çirokên gelêri çap kiriy. Pirtüka ku bi navê "Çirokên Gelêri yêñ kurdan" ji Enstituyê derketiye berhemeye berhevkarîye ya Zeki Akdag e. Her pirtükê berhevkarîye ya ji herêmên cuda giring e. Her pêdîvi pê heye ku çirok û çivanokên kurdi bêne berhevkirin, tomarkirin û weşandin. Di vê pirtükê de ji bi dehan çirok hene ku berhev kirine û gihandine ber destên xwendevanan. Hin çirok dibe versiyonê wan li herêmên din ji habin lê ev çirokên di vê pirtükê de

- Çirokên Gelêri yêñ Kurdan / Berhevkar Zeki Akdag / WeŞanêñ Enstituya Kurdi ya Stenbolê / 172 rûpel.. diyarname

Kurdî Xwes e

Kewar... خلية
Mamik... أحجية, لغز
Serxweş... سكران
Aso... أفق
Aran... صراء
Qelp... كسول
Gendelî... فساد
Hêman... عنصر
Lêgerîn... بحث

Xaçerêz Bersiva hejmara 45an

1	2	3	4	5	6	7	8
K	Ê	M	E	N	D	A	
U	D		H	E	Y	V	
R		A	R		E	D	L
D	Û		E	K		A	A
	N	A	M	E			S
Î		Z	A	N	I	S	T
D	R	A	N		Î	Î	Î
A	R	D		N	E	H	K

Bersiva peyva windayî 45: Avdar



Nûce... Bi Zelalî

Zübêj

Şîv Kundir, Paşîv Kundir,
Ez a Rindtir Naxwim Kundir.

Xaçerêz

1	2	3	4	5	6	7	8	9	10
1									
2									
3									
4									
5									
6									
7									
8									
9									
10									

Asoyî:

- 1- Rojnameya kurdî ya yekem.
- 2- Erê bi zimanekî din, leşkerên pir.
- 3- Xwarina nîvro.
- 4- Serekê gund, zarokek jê re bû, genimê hêrtî.
- 5- Endamekî laş(vajî), paşdaçek(vajî).
- 6- Dijî wer, germa.
- 7- Ji bo neyîniyê, rojeke heftiyê, birayê bav.
- 8- Alava xwedîtinê, nalîn(vajî).
- 9- Helbestevanekî navdar.
- 10- Paşdaçek, jêr.

Stûnî:

- 1- Bajarekî rojavayê Kurdistanê, ji çandiniyan e.
- 2- Eger(vajî), li ser qadê ye(vajî), perêن yekî li yê din in(vajî).
- 3- pirtûka wateyeyan.
- 4- Li daristanê hene, wek hev.
- 5- Miletik e, wek hev.
- 6- Xwarineke genimî, mal(vajî).
- 7- Reş, bê av, cînaveke kesî.
- 8- Welatekî asya+ji bo dirûtinê(vajî), piş.
- 9- Ji bo gelekjimara navan (vajî), mirov(vajî).
- 10- Kêf, sewal.

Peyva wendayî

Bibe çûkê newala, nebe mirîşka nav mala. Axa li kêfê ye, mal li bin berfê ye.

Peyva wendayî: Ji 6 tîpan: Amûereke mûzîkê.

1	2	3	4	5	6	7	8
N	E	W	A	L	A	M	B
A	X	A	L	I	T	A	I
Ê	F	R	E	B	Ê	L	B
L	I	B	I	N	F	A	E
Y	E	E	Y	E	Ê	M	N
L	A	M	B	Ü	K	R	E
A	K	Ş	Î	R	I	M	B
N	A	V	Ê	K	Û	Ç	E